1 Hezîranê
Rojnameya we
Azadiya Welat




li bayiyan e


**Baydemîr:**

## Mîhrîcan xizmetî ronesansê dike

*DER BARÊ* 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê ya îsal û salên borî de me pirsên xwe ji Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr kirin. Baydemîr anî ziman ku cara 9'emîn e mîhrîcan pêk tê û ev mîhrîcan bûye bingeha gelek tiştan û mebesta wan ew e ku mîhrîcana Amedê bibe wekî saziyekê û bigihêje asteke navneteweyî. Baydemîr mîhrîcan wekî bingeha reform û ronesansên kurdan binav kir û anî ziman ku mîhrîcan dê hem di nav hemû kurdan de û hem jî di nav gelên Rojhilata Navîn de bibe pire... RÛPEL - 2





## Mîhrîcana bi rengên bi kurdî dest pê kir

*LI AMEDÊ* rojên şahî û mîhrîcanê dest pê kirin. 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê dest pê kir. Koma Rengîna Mezopotamyayê jî dê di çarçoveya mîhrîcanê de derkeve ser dikê. Ekîb ji koma 14 kesî ya govendê, koroya 20 kesî, 16 estrûmantarjen, koma şanoyê ya 6 kesî, 2 dengbêj û ekîba teknîk pêk tê. Kom dê li ser dikê, berhemên xwe yên wekî; muzîk, şano, govend û dengbêjiyê pêşkêş bike. Rengîna Mezopotamyayê xebata herî berfireh a NÇM'ê ya ji roja hatiya avakirin a heta niha ye... RÛPEL - 6


# Hawar

Rojnameya Rojane
28 Gulan 2009
Pêncşem
Sal: 1
Hejmar: 23
Buha: 50 Kr


# 'Rengê projeya wan tasfiye ye'



Parlamenterê ANAVATAN'ê yê berê Abdulbakî Erdogmuş li ser nîqaşên siyasî axivî û wiha got: 'Tişta ji çareseriyê fêm dikin tasfiyeya PKK'ê ye. Lê bêyî PKK çareserî nabe'

**'NÎQAŞ NE ZELAL IN'**

Parlamenterê ANAVATAN'ê û Cîgirê Serokê Giştî yê Partiyê yê berê Abdulbakî Erdogmuş bal kişand ser rola PKK û DTP'ê ya di çareseriya pirsgirêkê de. Erdogmuş got ne diyar e ka çareseriya pirsgirêkê tê xwestin an na.

**'DIVÊ KURD HIŞYAR BIN'**

Erdogmuş da zanîn ku pêvajo nazik e û wiha got: "Ma qey dê tasfiyekirina PKK'ê xizmetî çareseriya pirsgirêka kurd bike? Aliyê din jî pêşketinên li herêmê ne. Nêzîkatiya Amerîka ya têkildarî herêmê girîng e."

**'BÊ ŞERT ÇEK NAYÊN DANÎN'**

Erdogmuş li ser çekdanîna PKK'ê jî sekinî û got: PKK bêyî garantî û şert çekan danayne. Ev yek li dijî xwezayê ye. Tevgerek ku ev 30 sal in bi çekê têkoşîn daye, bêyî garantî, ne rehet e ku ew çekên xwe deyne."... R.4



## 'Divê hikûmet heta 1'ê hezîranê gavan bavêje'

*RÊXISTINÊN* civakî yên sivîl, rêxistinên kedê û parêzvanên mafên mirovan, dan zanîn ku dema agirbesta yekalî ya ji aliyê KCK'ê ve ji bo çareseriya pirsgirêka kurd a bi rê û rêbazên demokratîk hatiye îlankirin di 1'ê hezîranê de bi dawî dibe û ji bo dema agirbestê bi şiklekî hîn tekûztir berdewam bike, wan xwest hikûmet gavên berbiçav bavêje... RÛPEL - 4

## Abdullah Gul dîsa axivî lê...

Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul der barê pirsgirêka kurd û çareseriya wê de li Qirxizistanê axivî û wiha got: "Heke em çareseriyê ji pirsgirêka mezin a Tirkiyeyê (pirsa kurd) re nebînin dê alozî û pirsgirêk girantir bibin. Lewre ji divê her kes bi awayekî maqûl nêzî mijarê bibe. Cihê lê şîdet heye nabe ku demokrasî li wir hebe. Gul xwest ku DTP û partiyên muxalefetê jî zêdetir xizmetî çareseriyê bikin ji daxuyaniyên ku mijarê sor dikin dûr bisekinin." Lê balkêş e ku Gul li ser pirsekê got ku ew nafikirin ku bi rêxistinê re bikevin nava bazarekê.



## Daxwaza aştiyê ji Şirnexê bilind bû

*Rêxistina DTP'ê ya Şirnexê, meşa "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike" li dar xist. Bi sedan kesên di saetên sibehê de li ber avahiya DTP'a Şirnexê kom bûn ji vir ber bi Qada Cumhuriyetê ve meşiyan. Bi sedan kesên tevî meşa "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike" ya li Şirnexê pêk hat, bûn, çareseriya pirsgirêka kurd xwestin...* RÛPEL - 4

## Leşkeran di odeya doktor de îşkence kirin

Girtiya bi navê Ajda Încî ku li Girtîgeha Jinan a Sîncanê dibîne, hate îdiakirin ku dema ji bo tedawîkirinê ew birine nexweşxaneyê hem ji aliyê leşkeran ve tedawiya wê hatiye astengkirin û hem jî rastî lêdana mist û pehînan hatiye. Li gorî agahiya hat bidestxistin hate îdiakirin ku ji ber lêdanê di hin deverên laşê Înciyê de şikandin pêk hatiye û ji ber ewlekariya canê wê tuneye tevî pêwîst e tedawî bibe jî naçe nexweşxaneyê... RÛPEL - 3

## 500 jinên akademîsyen li Amedê tên cem hev

**XEBATÊN** ji bo mîtînga di 31'ê gulanê de bi navê, "Lihevhatina Jinan" pêk tê, berdewam dikin. Endama Meclîsa Jinan a Navendî ya DTP'ê Selma Soker agahî dan û got forûmek dê bi tevlîbûna 500 akademîsyenên jin li Amedê li ser pirsgirêka kurd bê lidarxistin... RÛPEL - 7



www.arsivakurdi.org



# Sebra kurdan jî heta derekê ye

## Parlamenter, siyasetmedar û girseyên qelebalix çûn sersaxiya malbatên gerîlayên HPG'î. Di sersaxiyê de bangewaziya ji bo bersivdayîna biryara bêçalakîbûnê ya KCK'ê hate kirin û hate gotin ku zêde wext nemaye

Di şerê nav Hêzên Parastina Gel û Artêşa Tirk ên li navçeya Dihê ya Sêrtê, li navçeya Licê ya Amedê û li navçeya Melezgirta Mûşê de gerîlayên jiyana xwe ji dest dan, cenazeyên wan bi girseyên ku 10 hezaran kurd beşdar bûn hatin hildan û ji bo wan li Êlih, Gever, Sêrt, Şirnex û Patnos û Melezgirê konê sersaxiyê hatin vekirin û gel bi girseyî diçin konên sersaxiyê û sersaxiyê li malbatên gerîlayan dikin.

**ÊLIH:** Niyazî Akin li çoltera Dihê ya Sêrtê di şerê navbera gerîla û leşkerên tirk de ligel 3 hevalên xwe roja 17'ê gulanê jiyana xwe ji dest dabû. Cenazeyê Akin bi beşdariya hezaran kesî hat hildan û li taxa Baglara Êlihê kona sersaxiyê hat vedan. Serokê DTP'a Êlihê Ozcan Erdem, Şaredarê Hezo Raşît Haşîmî, Şaredarê Bekîrxanê Selahattîn Bulak, rêveberên DTP'î, endamên meclîsa Şaredarî û endamên meclisa giştî ya Êlihê û ligel hezaran kesî çûn sersaxiya malbata Akin. Girseyê bênavber di meşê de dirûşmên wek "Şehîd namirin", "Bijî Serok Apo","Ji Îmraliyê re hezar silav" hatin qîrîn. Bavê Akinê HPG'î Beşîr Akin got ku ev şer heta ku dê bidome. PKK'ê heta 1'ê hezîranê biryara bêçalakiyê daye, lê ligel vê jî artêş bênavber êrîş dike. Serokê DTP'a Êlihê Ozcan Erdem jî diyar kir ku heke operasyon bidomin ji bo çareseriyê çiqas gotin bên diyarkirin jî bêwate ye. Rê riya çareseriyê ye û ji ber vê jî em bang li hikûmetê dikin ku operasyonan rawestîne.

**COLEMÊRG:** Ji bo Alî Îhsan Îke yê HPG'î ku roja 22'yê gulanê di şerê navbera HPG'ê û artêşa Tirk de li Licê ya Amedê jiyana xwe ji dest da li Geverê bi beşdariya 50 hezarî hat hildan piştî cenaze hat definkirin kona sersaxiyê hat vedan. Di taziyeyê de Parlamenterê DTP'î yê Wanê Ozdal Uçer diyar kir ku Koma Civakên Kurdistanê heta roja 1'ê hezîranê rewşa bêçalakiyê îlan kiriye. Di vê pêvajoyê de em li bendê bûn ku rewşeke aram ku şer dê neqewime derkeve holê û rê li ber aştiyê vebe. Lê mixabin zarokên kurdan tên qetilkirin. Ji ber cenazeyên ku tên sebra gelê me jî namîne. Ji bo 1'ê hezîranê çima divê êdî hikûmet jî destê xwe bixe bin vî barî.

**ÇELÊ:** Li navçeya Çelê ya Colemêrgê ji bo gerîlayê HPG'ê Abdulganî Ayar jî konê sersaxiyê hat vedan û bê ku navber bikevê sersaxî didome. Nûnerên KESK, DÎVES û DTP'ê jî bi girseyî çûn sersaxiyê. Di vê serdanê de hat gotin ku dê kurd heta dawiyê têkoşîna Ayar esas bigirin û heta kurd mafên xwe bi dest nexin dê ev têkoşîn jî bê ku navber bikeve bidome. Hat xwestin ku bersiv ji bo biryara bêçalakiyê ya KCK'ê bê dayîn.

Di taziya gerîlayên ku ji ber şerê herêmê jiyana xwe ji dest dane de bang û peyamên krîtîk tên kirin. Di serî de li Gever, Melezgir û Çelê hat xwestin ku şer bisekine, xwîn raweste û bersiv ji bo biryara bêçalaktiyê bê dayîn. **ÊLIH / DÎHA**

# Ji ber nîjadperestan dîsa koçber bûn

Jiyana malbata Savaş Guler ku li navçeya Akyaziya Sakaryayê di êrîşa ulkuciyan a bi çek de jiyana xwe ji dest da, li ser riyan derbas bû. Serpêhatiya koçberiya malbata Guler piştî ku gundê wan ji aliyê leşkeran ve hate şewitandin û koçî Amedê kirin, dest pê dike.

Ciwanê kurd Savaş Guler û birayê wî Recep Cen Guler hefteyên borî li kolana Ada ya li navçeya Akyaziya Sakaryayê di salona pîde û lehmecûnê de êvara 19'ê gulanê rastî êrîşa çekdarî ya Sedat Alan û Zahît Bostanci yên nijadperestên tirk hat. Di êrîşê de Savaş Guler jiyana xwe ji dest da, birayê wî jî birîndar bû.

### Dawî li koçberiyê nayê

Piştî bûyera lîncê malbatê biryara çûyîna Amedê da. Biryara ji Sakaryayê koçkirina Amedê ne biryara cara yekem e. Malbata Guler 20 sal berî ji ber ku dewletê gundê wan ê Şêxana navçeya Hênê ya Amedê dişewitîne koçî taxa Amedê dikin.

### Li welat jiyana xwe ji dest dide

Bavê Guler, Hecî Emîn Guler ji ber ku qeza kir û di qazayê de jiyana xwe da, ligel ku li hev jî hatin koçî Sakaryayê kir. Hecî Emîn Guler 2 sal berî niha di encama qeyrana dil de jiyana xwe ji dest dide.

### Ji ber ku kurd bû hat kuştin


Dayika Guler, Kevser Guler, diyar kir bûyer li ber çavên polîsan qewimî ye û wiha axivî: "Dema kurên min rastî êrîşê hatin polîs ji wir çûn. Ku dewlet dewlet bûya dê li mafê zarokên min xwedî derketa. Ku hêza min hebe, ez dê heta dawî li mafê xwe xwedî derkevim lê ku nebe jî ez wan hewaleyî Xwedê dikim."

### Em neçar man û me koç kir

Guler, anî ziman ku piştî bûyerê êdî li Sakaryayê nikaribûn bimînin û ev tişt gotin: "Li 2 zarokên min dan. Kurê min yê 3'yemîn tevî ku li ser serê wan bi qîrîn alîkariyê dixwaze jî kesê alîkarî nedayê. Ma em bi ku ve biçin, em ji Tirkiyeyê derkevin? Kurê min kuştin ma ez dê çawa li wir bimama? Me biryara hatina Amedê da û em dê mala xwe bînin vir." **AMED / DÎHA**

# Leşkeran li ber bijîşk îşkence kirin

Li gorî agahiyên hatin bidistxistin girttiya bi navê Ajda Încî ku li Girtîgeha Jinan a Sîncanê dibîne di dema tedawîkirinê de hem ji aliyê leşkeran ve tedawiya wê hatiye astengkirin û hem jî rastî lêdana mist û pehînan hatiye. Hate gotin ku ji ber lêdanê hin hestiyên Înciyê şikestine û ji ber ewlekariya canê wê tuneye naçe nexweşxaneyê.



Ajda Încî

Girtiya bi navê Ajda Încî di nameya ji ÎHD'ê re şand de, anî ziman ku ji ber nexweşiya ulser û dil pê re pêş ketiye roja 15'ê gulanê ew birine Nexweşxaneya Dewletê ya Sîncanê. Înciyê got ku bijîşkê ji bo wê muayene bike ji leşkeran xwestiye ku ji odeyê derkevin.

### Li ber bijîşk li min dan

Di nameyê de tê diyarkirin ku leşkerê payedar ji odê derneket û gotiye, "Ev terorîst e, PKK'î ye. Hûn çawa nirx didin û muayene dikin" û bi wê kînê bi devkî ez tacîz kirin û wiha vegot: "Bijîşk neçar ma tevî kincan min muayene bike û dema tahlîlê de jî leşkerên payedar enjektora di destê min de kişandin û bi mistê li min dan."

### 'Xwestin wê lînc bikin'

Bavê Încî Hasîp Încî jî da zanîn ku çend cihan de hestiyên keça min şikandine û wiha got: "Dema tehlîla xwînê de yek jê payedar 7 leşker keça min ji odeya laboratuarê derdixin û di korîdorê de lê didin. Dema nexweş û xizmên nexweşan yên li wir dibêjin 'hûn çima li vê jinê didin' leşker dibêjin 'Ev PKK'î ye. 2 meh cezayê wê maye. Dema ji girtîgehê derkeve dê biçe serê çiyan' û kesên li wir jî provoke dibin û ji bo lînc bikin êrîşî keça min dikin."

### Ewlehiya canê wan jî nîn e

Încî, anî ziman ku ewlekariya canê keça wî tuneye û wiha derbirî: "Ji keça min re 2 meh mane. Lê ewlekariya canê wê tuneye. Qaşo leşkerên ji ewlekariya wê peywirdar, keça min xistin vî halî. Ev e edaleta vê dewletê? Di girtîgehê de jî tehamulî kurdan nakin. Ev zîhniyet dê çawa mafên kurdan bide. Keça min nexweş e lê bi hinceta PKK'î ye tedawî nakin." Hat diyarkirin ku wan serî li ÎHD'ê dane. **AMED / DÎHA**

# Êrîşa çawişê pispor a li Amedê bire Meclisê

Parlamentera DTP'ê ya Amedê Gultan Kişanak êrîşa çawişê pispor a li Dibistana Seretayî ya Şehîd Albay Guner Ekîcî anî rojeva Meclisê.

Parlamentera DTP'ê ya Amedê Gultan Kişanak êrîşa çawişê pispor a li Dibistana Seretayî ya Şehîd Albay Guner Ekîcî bi pirsniyarnameyek bi daxwaza bersivandina Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay û Wezîrê Perwerdehiyê Nîmet Çubukçu anî roja Meclisê. Kişanak di pirsniyarnameyê de bi bîr xist ku di 21'ê gulanê de subayek bi kincên leşkerî êrîş biriye ser Dibistana Seretayî ya Şehîd Albay Guner Ekîcî û li vir li xwendekarekî daye.

Kişanak di pirsniyarnameyê de wiha got: "Ligel ku subay xwendekar ji dersê derxistiye û lê daye jî, xwendekar bêyî parêzer û xizmetkarê civakî birine qereqolê û îfadeya wî girtine. Bêyî weliyê xwendekar ligel be muayeneya tenduristiyê hatiye kirin." Kişanak pirsa ka der barê vî subayî û personelên leşkerî de muameleyek hatiye kirin an na kir û Kişanak pirsa, "Di van rewşan de cezayek dîsîplînê yê çawa der barê personelên leşkeriyê de tê dayîn? jî kir. Kişanak bersiva pirsên, "Heta niha der barê vî subayî de çi hatiye kirin?", "Xwendekarek bêyî weliyê xwe çawa ji dersê derdixe?" jî xwestin. **ENQERE / DÎHA**

# Dikanên bi navê kurdî hatin girtin

Li Sûriyeyê di çarçoveya kampanyayeke nû ku li hemberî kurdan hatibû destpêkirin de, dikanên ku navê wan kurdî ne tên girtin. Li Şamê bi vê hinceta 10 dikan hatin girtin. Li gorî agahiyên ku ji nûneriya Koma Civakên Kurdistanê ya başûrojavayê Kurdistanê hat girtin ji bo ku kurd ji Şamê derkevin zext û zordariyên li ser esnafên kurd zêde dibin. Ji avabûna Sûriyeyê heta niha faşîzma yekzimanî li ser kurdan tê ferzkirin û her wiha di demên dawî de di çarçoveya kampayayeke nû de dikanên ku navê wan kurdî ne tên girtin. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin li Şamê li taxa Alkoswe 10 dikanên kurd ji aliyê hêzên ewlehiyê ve derê wan hat morkirin. **ŞAM / ANF**

## Dozger li mexdûr doz vekir

**ŞIRNEX**

Welatiyê bi navê Mehmet Paksoy (40) ku di xebatên hilbijartina 29'ê Adarê de rastî êrîşa çekdarî ya cerdevanan hat û Dozgerê Komarê yê Qilabanê jî lêpirsîn li Paksoy vekir. Paksoy anî ziman ku ew çûne dozgeriyê îfade dane û di îfadeyê de rastî neheqiyan hatine û vegot ku dozger jê re gotiye 'tu DTP'î yî, hûn ne musliman in û neheqî li wî kiriye û wî jî bertek nîşan daye û wiha didomîne: "Dema min bertek nîşan da hêrs bû û bi min de kir qêrîn. Ez derxistim derve û îfadeya min negirt." Paksoy destnîşan kir ku ew rastî êrîşa cerdevan hatine lê ji ber ku em DTP'î ne dozger wek alî tevdigere û doz li me vedike. Ev ne hiqûqî ye û bêedaletî ye.

## Li Şirnex û Sêrtê 2 kes hatin binçavkirin

**ŞIRNEX**

Li Şirnex û Sêrtê di encama serdagirtina malan a li Taxa Vakifkent a Şirnexê de Sidik Kilinç hate binçavkirin. Kiliç birin 23'yemîn Fermandariya Tumena Cendirmeyan. Sedema binçavkirina Kiliç nehat zanîn. Li Sêrtê jî polîsan di saetên sibê de li Taxa Yeniyê bi ser mala rêveberê MKM-Derê Mustafa Gunduz de girtin. Piştî lêgerîna li malê, Gunduz hate binçavkirin. Sedema girtina Gunduz nayê zanîn.

## Li Êlihê serdagirtin û binçavkirin didome

**ÊLIH**

Li gorî agahiyên hatin bidestxistin duh Polîsên Midûriyeta Êlihê di saetên serê sibê de bi ser gelek malan de girt. Di serdagirtinan de Îsmet Apaydin û Ekrem Şimşek hatin binçavkirin. Her wiha di encama serdagirtinên Fermandariya Alaya Êlihê de jî Endamê Meclisa Şaredariyê Îhsan Ekîncî û hemwelatiyê bi navê Şaban Deger û kesek navê wî nediyar hatin binçavkirin.

## Li Cizîr û Silopiyê sewqiyata leşkerî

**ŞIRNEX**

Ji navçeya Cizîrê ber bi navçeya Silopiyê ve tanq û wesayîtên zirhî hatin sewqkirin. Hate daxuyandin ku sewqiyata ji 5 tanq û 5 wesayîtên zirhî pêk dihat, ber bi çiyayê Cûdî ve tê kirin. Di vê navberê de operasyonên li Bestan, Haftanîn û Çiravê jî berdewam dikin.

## Kongreya TUYAD-DER'a Wanê pêk hat

**WAN**

TUYAD-DER'a Wanê 5'emîn Kongreya xwe ya Giştî li Komeleya Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM-Der) pêk anî. Rêveberên DTP'ê, ÎHD, Goç-Der'a Wanê, Însiyatîfa Dayikên Aştiyê, Însiyatîfa Malbatên Şehîdan, DOKH, Meclîsa Jinan a DTP'ê, Egîtîm Sen, Tum Bel-Sen û nûnerên Komeleya Oldaran a Wanê tevî kongreyê bûn. Li salonê pankartên "Tecrîd sûcê mirovahiyê ye dê neyê qebûlkirin", û dovîzên, "Bila Îmrali bê girtin", "Di girtîgehan de hîn jî kurdî qedexe ye" hatin daliqandin. Hat gotin ku ji bo bidestxistina mafên kurdan çi pêwîst be dê bikin.

## Li Kirmanşanê 40 cerdevanî çek danî

**KİRMAŞAN**

Li bajarê Kirmanşana rojhilatê Kurdistanê piştî şerê navbera gerîlayên PJAK û leşkerên Îranê de 43 leşker û cerdevan hatin kuştin, PJAK'ê bang li cerdevanan kir da ku çeka xwe deynin û dev ji cerdevaniyê berdin. Li ser vê bangê li navçeya Ciwanro Kirmanşanê 40 cerdevanî çekên xwe teslîmî hêzên Îranê kir û diyar kirin ku ew êdî cerdevaniyê nakin û dernakevin operasyonan.

# Rêheval Qedrî Gokdere

**HASAN OZGUNEŞ**

Mirinê rûyê xwe yê sar dîsa nîşanî me da. Di rastiyê de em di vê axa pîroz û têr êş de tu carî ji rûçikê wî yê tehl û tirş xelas nebûn. Her roj mirinek an jî çend û çend mirin… Xemên me her katjimêrê, her xulekê wekî pîramîdên Misrê dikevin ser hev.

Gelê me dibêje "mirin heq e" belê rast e mirina dema xwede be hem heq e hem ji pêdivî ye. Belê mirina ne di dema xwe de be, ji jehrê jî tehltir û nexweştir e. Mixabin di vê xaka pîroz de me tim mirinên bê dem ditîn û jiya. Her mirinek parçeyek ji kezeba me bi xwe re bir. Wekî mirina rêheval Qedrî Gokdere û gelek û gelekên din!

Belê heval Qedrî rastî jî mirina te ya bê dem kezeba me peritand û şewitand. Kezeba me ji xwe ne saxlem bû, bi salan e her tim ji aliyê dagirker û kedxwaran ve derbê dixwe…

Ma qey êşa te bi xwe jî ne êşa kezebê bû?

Ez dizanim, te ji min re gotibû, ji xortaniya xwe bi eşq û dil te xwe ber barê vê gelê belêngaz û mirovahiyê re kiribû. Ev bar barê azadî, wekhevî, demokrasî mirovbûnê bû. Belê barekî giran bû û berdela wî jî giran bû. "Ji kurdan re siyaset kirin gumlekê agir liberxwe kirin bû, bi derzî bîr kolan bû…" Di nava vî karwanî de meşîn karê leheng û egîdan bû…

Te biryara xwe ji zû de dabû. Barê herî giran hemûyan te digot wî bidine min. Bi rastî dema me hevdu nas kir rojên giran bûn û bar jî giran bû.

Li bajarê dilan, xeyalê milyonan, li Ameda rengîn di 1992'yan de me hevdu naskiribû. Rastî jî rojên man û nemanê bûn. Gelê kurd li ser piyan bû, berxwedan mezin bû. Êrîş jî mezin û dijwar bûn. Kuştinên kiryarên wî diyar û nediyar her roj li ber çavên me dihatin kirin. Jiyan li gelê me li çar aliyê welat bûbû dojeh. Li teniştên riyan, li binê piran û li kolanên bajar û gundan her roj cendekên lehengên kurdan kuştî dihatin dîtin. Rûyê qatil û celadan her dem li cihekî cuda di demekê bêwext de diket pêşberî me. Her demjimêrekê nûçeya kuştinekê an jî revandinek nû dihate guhê me, dilê me ditengijî û kezeba me dîsa dest bi şewatê dikir… Apê Mûsa, Vedat Aydin, Necatî Aydin, Mehmet Geren, Hafiz Akdemîr, Receb Oyur û gelek, gelekên din…

Aliyek girtin, koçberkirin, kuştin û revandin, li aliyê din jî berxwedan, serhildan, hêvî û berdewama meşa karwanê azadiyê…

Di nava vî agirî de ez û tu bi hevre di rêveberiya Egîtim-Senê ya Amedê de bûn. Ez serok tu jî sekreterê rêxistinê bû. Êş, tirs û kenê me bi hev re bû. 27 hevalên me yên sendîkaya Egîtîm-Senê di dema me de şehîd bûn û 17 jî birîndar bûn. 184 jî sirgûn bûn û gelek tiştên din…

Hevalê delal; ez vê gotina xwe bê pesin û ji dil dibêjım. Sekna te, berxwedana te, fedekariya te germahî û wêrekî dida hemû hevalan. Li Amedê damezirandina Platforma Demokrasiyê, KESK'ê û damezirandina Rêxistina Kedkarên Welatparêz û di hemû cureyên têkoşînê de para te ya herî mezin bû. Me ji hev re tim ev digot: "berdel çibe bila bibe divê ev karwanê azadiyê bimeşe"…

Belê Rêhevalê Delal !

Pêşiyên me dibêjin; "eger kurmê darê ne ji nava darê be zewala darê nabe" Mala xiyanetê xirab bibe! Xiyanet tu û heval Taha xistin zîndanê. Deh salên we di zindanê de di bin zext û zorê de derbas bû. Tu bûye hevalê gelek lehengan. Te Cangorî Îsmet Baycan nas kir. Ew jî bi êşa dil çû ser dilovaniya xwe. Êşa wî jî li ser hemû êşan bû bar û kezeba te hîn bêtir şewitand.

Belê rêhevalê hêja, lehengê Liceya rengîn, gotin têra şîroveya we cangoriyan nake. We barê me girantir kir, belê we riya me jî ronîtir kir.

Em sozê didin we ku ev karwanê azadiyê wê neraweste. Heta ku gelê me digihê te hemû mafên xwe. Oxir be ji te re, oxir be ji we re cangoriyên leheng…

# Ji Xwedawenda Agir re

*ji warên evînê re*
*û ji stêrkên bênav re...*

*li ser giravê*
*heft taq ewrên reş girtine*
*û refên qeşmer ên reş*
*difirin ber bi asîmanan ve*
*li perava Haftanînê tu digerî*
*lê belê dilê te*
*her tim li giravê lê dide*

*di salvegera her panzdehê*
*reşemiyê de*
*bi dilê xwe yê xemgînî*
*li ser kortîka dilê evînê û di*
*hêlîna şikeftê de*
*tu rûniştî, ketî nav xeyalên kûr*
*û bêdawî*
*her şev di xeyalên min de*
*mîna zarokekî diya xwe*
*windakirî*
*çiya bi çiya digerî*
*hilma xwe dikişînî*
*bi kirasê xwe yê xemgînî*
*rondikên çavên xwe paqij dikî*
*hin caran dikenî, hin caran*
*digirî û dimeşî*

*di çirûskên çavan de hêvî*
*dirijin*
*dilê min di çarmixê de*
*êşa mirinê û jiyanê bi hevr e lê*
*dide*
*êşa çarmixê hin caran*
*min bê nefes dihêle*

*her dem nameya te ya evînî û*
*xwînî*
*ji çiyayê Heftanînê*
*li ser baskê kevokê*
*ber bi giravê ve difirin*
*li ber avên bêhêvîtiyê û*
*mirovên tuneyî de*
*tu buyî hêvî*

*ez nizanim nîvê şevê bû*
*an jî berbanga sibê*
*min li asîmana hêşîn dinêrî*
*hemû stêrkan cihê xwe guhartibûn*
*min nas nekir kîjan stêrka te bû*
*li taqa heftan*
*stêrka gelawêjê di cihê xwe de*
*dibiriqî*

*ez di hêlika evînê de raketibûm*
*bi awaza helbestên dengbêjan*
*evîna te azadî dixwend*
*bi dengê awaza şiyar dibûm.*
*bi lorîkên te yên xemgînî*
*radizam*

*ber bi demsala biharê ve*
*te bi agirê pîroz şûşt bedena*
*xwe*
*li ser axa pîroz*
*bayê evînê wêneya te*
*dinexşand*
*di nav baxçê gulan de*
*Heftanîn bi xweşikbûna te bû*
*Vîyan*
*Viyan bû Heftanîn*
*da ku agir bû vîn, Viyan bû*
*evîn.*

***HACER XELÎL YUSUF***





evdilekoçer@yahoo.com

**Evdile KOÇER**

# Garanê bimeş bimeş…

Bide dû dûmana nivîskarên kedî û xwe-sansûrkirî! Çavên xwe yên delal fêrî 'quncik'ên vîkîvala bike. Birîna civaka xwe bispêre destê du devçeltikan.

Wîjdana nivîsê neyne bîra wan ji bo Xwedê. Ji mekteb û fêrgeha wan fêrî soz û bendên qewlborî bibe.

Bide dû rêça helbest û gotinên beravêtiyan, da ku tu rihê helbesta 'azad' nas nekî; da ku rihê te bêhemdî jî be 'Pireya Hezkirinê' tewaf neke.

Garanê bimeş bimeşşşş…

Bide dû meş û şeqreqa xwedubarekirinê!

Lê nebî nebî tu rojekê jî fikrên radîkal ji xwe re bixî pirseke tirsonek. Nigê xwe bike wê pêlava erzan ya ku şev û roj li ser serê me digevize.

Xerîteya rihê xwe bike qurbana dû serseriyan, bide ser rêça gûyê wan.

Garanê bimeş bimeşşşş…

Bide dû şeqşeq û çeqçeqê. Fêrî strana çeqçeqokê bibe. Li ber dirdir û birbirê 'hêvî'yên xwe şîn bike. Li kêleka zirzirok û tirtirokan behsa pirpirokan bike.

Xwe li çemê xirxir û birbirê bide. De tu jî wekî wan bide dû firfirokê! De tu jî kevçiyê xwe li girara gijgijokan bide gidîîîî. Heyyyttt min çavê te xwarooo!

Garanê bimeş bimeşşşş…

Bide ser rêçeke nenas. Mûyên pozê xwe ji koleksiyona xêrjixwenediyan re veşêre. Nîvhenekekê jî li kum û şaşika cîranê xwe neke. Diayekê xwe ji riya rêwiyekî re nexe tiberik.

Bi wê hilma devê xwe pêlavên 'xayîn û qehreman'ên serkaniyê bibiriqîne. Qûtê zarokên xwe ji wan 'zikmezin'an re bixe eyd û bimbarek.

Bide ser tir û fisên 'zana û seyda'yên qunneşûştî. Bila guharên 'Nezan nizane ku nezane!' bi guhê te ve dahelînin.

Garanê bimeş bimeşşşş…

Bide dû dîn û îmana wan ya bêmiraz. Li ber rexneyên wan bigirî û cegera xwe biperitîne. Rojê sê danan pesnê wan bide, ka Xwedê gotiye çi!

Xwe fêrî rê û rêbazên siyaseta wan ya zarokane bike. Ji bo mijûlahiya wan hewl bide tu jî leyîstokeke nû biafrîne. Di nava wê felsefeya zarokane de bîra zarokatiya xwe bike. Behsa 'îzm'eke nû bike, bila kêfa cemaetê were, heyyt min kezeba te xwarooo!

Garanê bimeş bimeşşşş…

Bide dû tovê kundirên wan. Ji xwe re pêşerojeke berhewa ava bike da ku tu rojekê li ba bikevî. Di nava 'Sûka Kundiran'an de behsa bayê xwe yê di qûna kerê mirî de bike, belkî hema Xwedê tiştek pê ve hat.

Bide ser rêça kefenê xwe. Bibîne ka kefenê te çawa didirûn, bi kîjan derewan boyax dikin. Deng neke, bila pêjna te neyê haaa, xwe tev nede heyran, şşşşşttttt, heyyt tu berxê min î haaa!


Garanê bimeş bimeşşşş…

HAWARA EYŞO

SIYASETA EYŞO




ERDOGAN Û KEÇELOKÊN WÎ




QÊRÎNA ZAROKÊN GEZAYÊ NAGIHÊ RAYEDARÊN EREBAN




ŞERMEZARKIRINÊN BÊ WATE



# Mîhrîcanê bi pêşangehan dest pê kir

**Mîhrîcana Amedê bi vekirina 4 pêşangehên cuda û atolye û stranên koroya Navenda Çanda Dîcle û Firatê dest pê kir. Mîhrîcan îro dê bi panel, şano, sînema û konserekê berdewam be**

9'emîn mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bi vekirina 4 pêşangehên cuda dest pê kir. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê bang hemû kesî kir ku ji bo aştiyê beşdarî mîhrîcanê bibin.

Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê ku 4 rojan pêk were dest pê kir. Şaredar Baydemîr û serokê DTP'a Amedê Alî Şîmşek beşdarî merasîmên vekirina pêşangehan ên li Mêvanxana Şaredariyê pêşangeha Fevzî Bîlge ya bi navê 'Çend Zeman Buhurîn' û pêşangeha Rabîha Arslan ya bi navê 'Jin' bûn.

Her wiha li Sumerparkê jî pêşangeha Kemal Zengîn ku hê di girtîgeha Mêrdînê de ye û pêşangeha M. Alî Yaşa ya bi navê 'Bi Çavê Zarokên Mexmûrî ve Mexmûr' hatin vekirin. Şaredar Osman Baydemîr li vir axaftineke kurt kir û anî ziman ku bila mîhrîcan bibe sedema rojên aştî û azadiyê û bi vê sedemê hemû amedî vexwendin mîhrîcanê.

Baydemîr di çarçoveya xebatên çand û hunerê de atolyeya 'Seramîk Pana' ziyaret kir. Her wiha pêşangeheke din jî li Navenda Çanda Dîcle û Firatê hate vekirin. Pêşangeha wênesaz Haci Çelîk ku ji 40 tabloyan pêk tê bi navê 'Roj' hate vekirin. Pêşangeha Çelîk a bi navê 'Roj' rastî eleqeyeke germ hat. Herî dawî jî Salona Konferansê ya Şaredariya Bajarê Mezin pêşangeha Umut Kaçar a bi navê 'Qerejdag' hate vekirin. Vekirina vê pêşangehê jî ji aliyê Alî Şîmşek ve pêk hat.

Koroya bi navê 'Rengê Me û Dengê Me' ku di bin banê Navenda Çanda Dîcle û Firatê de xebatên xwe didomîne stranên nostaljîk pêşkêş kirin.

Di çarçoveya mîhrîcanê de di bernameya îro de panela mijara 'Jin, Namûs, Azadî', Dîwana Denbêjan, Meşa Mîhrîcanê, Şano, nîşandana fîlm û konsera vekirinê pêk bê. Koma Nûjen, Rojda û Ozlem Ozdîl dê beşdarî konsera qada Deriyê Çiyê bibe. **AMED**



## 'Rengîna Mezopotamya' dê li Amedê derkeve pêşberî hunerhezan

Koma Rengîna Mezopotamya ku ji 64 kesan pêk tê dê di 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de derkeve ser dikê. Ekîb ji koma 14 kesî ya govendê, koroya 20 kesî, 16 estrûmantarjen, koma şanoyê ya 6 kesî, 2 dengbêj û ekîba teknîk pêk tê. Kom dê li ser dikê, berhemên xwe yên wekî Muzîk, Şano, govend û dengbêjiyê pêşkêş bike. Rengîna Mezopotamyayê xebata herî berfireh a NÇM'ê ya ji roja hatiya avakirin a heta niha ye.

Kom di bin baneya Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) a Edeneyê de jî ev 4 mehe xebatek berfireh tê meşandin. Xebatên hunermendên dê di mîhrîcanê de derkevin jî hate asta dawiyê. Koma ji 64 kesan pêk tê ya Rengîna Mezopotamyayê yekem car dê di çarçoveya mîhrîcanê de derkeve ser dikê. Koma di heman demê de dê şano, koro, govned, helbest, dengbêj û gelek estrûmantalan bîne cem hev. Xebata komê ya bi navê, "Rengên Me" jî yekem car di 29'ê gulanê de dê li Amedê derkeve ser dikê. Xebata rengê me ku zêdetir ji motîfên kurdewar pêk tê, berhemên bi zaraveyên kurdî zazakî, soranî û kurmancî, xebatên şano û folklarê pêşkêş dike. Koma dê efsaneya Newrozê jî pêkêş bike, di heman demê de xwedî taybetiya koma herî mezin a NÇM'ê ya heta îro ye. Ekîb ji koma 14 kesî ya govendê, koroya 20 kesî, 16 estrûmantarjen, koma şanoyê ya 6 kesî, 2 dengbêj û ekîba teknîk pêk tê. Koma piştî mîhrîcana Amedê di Mîhrîcana Çand û Xweza ya Mûnzûrê de jî dê motîfên elewiyan derxe pêş. Koordînatorê Hunerê yê Giştî yê Komê Erkan Eryîgît, diyar kir ku di nav 4 mehên dawiyê de xebatên xwe zêde kirine. Eryîgît diyar kir ku navê koma wa a giştî Rengîna Mezopotamya ye û xebatek pir berfireh e.

**'Em ê çanda xwe bidin nasandin'**

Eryîgît diyar kir ku tevahiya xebatkaran ji xebatkarên Navenda Çanda Mezopotamya ya Edeneyê pêk tê û ev tişt gotin: "

Berî her tiştî em dixwazin çanda xwe bidin nasandin. Em dixwazin çanda xwe ragihînin gelên din. Armanca me ya duyemîn jî ew e ku li hemberî çanda popîlîst, çanda alternatîf afirînin. Yanî li şûna berjewendiyên keseyî em dê hewil bidin nêrînek kolektîf derxin holê. Di nav koma me de li şûna hunera keseyî, xebata kolektîfaû çanda kolektîf li pêş e. Gelek merhaleyên projeyê hene. Pêşiyê em dê li Amedê derkevin ser dikê. Piştre em dê hewil bidin dubendiya ketiye nav çanda me ya ji heman kokê rakin. Em dê di navbera Botan û Dêrsimê de bibin pirek. Di navbera Serhat û Dêrsimê de riyek nû vekin. Em dê dengbêjê dêrsimî, yê serhadî û Xelefê Botanî û semaha Dêrsimê bînin cem hev. Ev xebat dê çanda mezopotamyayê ya din jî bigihîne hev."

Solîstê Koma Rewşan û berpirsyarê muzîkê yê Rengîna Mezopotamya Harun Ataman jî diyar kir ku bersiva xebata wan a herî mezin li hemberî pergala kapîtalîst e û wiha domand: "Em dixwazin rengên li ser xweheziyê ji hev hatine cudakirin, bînin cme hev. Em dê ji rengên cuda kolektîfekê biafirînin. Çiqas rengên cuda hebin ew qas hilberînek rengîn derdikeve holê. Edene metropola herî mezin a li ser riya Kurdistanê ye. Li vir nifûsek mezin a kurdan heye. Piraniya wan di encama şewitandina gundan de hatine vir. Girseyek polîtîk e û li hemberî pêşveçûnên herêmê refleksê nîşan dide. Ji ber ku ez di nav xebatên komê de cih digirim ez xwe bi şans dibînim. Em dê hewl bidin ku hemû rengên Mezopotamyayê bînin cem hev." **EDENE**

## Mîhrîcana Amedê dê zindî bê weşandin

Hemû çalakiyên Mîhrîcana Amedê heta 4 rojan dê her şev saet ji 20.00'an dest pê bike heta 3 saetan bi şiklekî zindî bê weşandin. Hemû kes dê bikaribin bê logo, şîfre û heqdest xwe bigihîne weşanan. Ji pêşengehên wêneyan bigire heta tabloyan, ji sînemayê bigire heta şanoyê, ji reqsê bigere heta konseran, ji dîwana dengbêjan bigire heta panelan, meş û şahiya firfirokan gelek çalakiyên di mîhrîcanê de cih digirin dê di ser peykê de bi şiklekî zindî bên weşandin. Weşanên ku dê bê logo û şîfre bên pêkanîn, saziyên weşanê yên bixwazin dikarin qeyd bikin û piştre biweşînin.

***Dîrok û saetên weşana zindî:***

28'ê gulanê roja pencşemê saet di navbera 20.00-23.00'an de

29'ê gulanê roja înê saet di navbera 20.00-23.00'an de

30'ê gulanê roja şemiyê saet di navbera 20.00-23.00'an de. Ji bo xwe gihandina weşanê divê frekansên satalaytê wiha bên eyarkirin:

*EUTELSAT W1, 10 DERECE ROJHILA*
*TPX: B 4*
*D/L: 11041.0 MHZ*
*POL: VERTICAL*
*S.ORANI: 3125 ksym/S FEC: 3/4*



Şevçira

Omer Dilsoz

omerdilsoz@yahoo.com

## Gever

Zarokên çavçiya, awirbaz rabûn ji ser sînga te. Mezin bûn bi şîrê dilsoziyê, bi nanê mêrxasiyê, bi ava dildariyê û her yek ji wan bû 'şêrgeleyek' di dergûşa çiyayên te de…

Hemû jî nazdarên ber dilê dêûbavê xwe bûn; hemû jî dilxwazê jiyaneke tisî bûn a tijî hêvî, tijî hezkirin û bi xewnên azadiyê bişkuvî, bi xweziyên însanetiyê xemiliyayî...

Gever, hemû berxên ber makê bûn, hemû keç û kurên nazdar, êkanên malê bûn. Yek bi yek wekî guleke bişkojk di temenê bûk û zavatiyê de qipandin, çilmisandin û avêtin çalên bêbinî û jehr pê werkirî...

Gever, ew hemû zarokên ber paxila dayika xwe bûn; keç û lawên çavçiya, dilgever, rûşilêr, kenstêrk… Ew hemû nêrgizên dora çem û kaniyan, sosinên li şikêr û zinarên herî asê bûn; ne bi yek, bi hezaran bûn û kit bi kit ketin axê, bûn tovê jiyaneke nû, bûn bi hezaran nav û nîşan û tîrêj bi tîrêj hilpeşkîn nava dilê te Gever…

Gever, dîsa stêrkek rijiya ser asîmanê te, dîsa berxikek ber makê ji paxila diya xwe hate vederkirin û dîsa şilêrek sernixwîn rondikên xwe yên jehrîn berdane hinavên xwe.

Dîsa bihar e Gever; hemû gulgeverên li paxila te dibişirin; binevş binevş radimûsin tîrêjên tavê û mor mor bêhna xwe didin çardorên xwe.

Dîsa dilê te çarparçekirî ye Gever… Ji mêlaka te xwîna reş tê… Ji cergê te veresiya dîsa bişkojeke taze, xwençeyeke nûgiha û stêrkek dîsa xwe penîçav dike ji nav koman stêrkên te Gever!...

Û zarokên te yên ku qewlên mêrxasiyê bi cîhanê daye jiberkirin, dîsa li ber sînga guleyan mertal, li ber sînga zilma hezar salan a roma reş serhildêr û dilpola ne; yariyên xwe bi mirinê dikin, kaba bi kuştinê diavêjin û axa te bi xwîna xwe av didin.

Gever, zarokên efsaneyan xwedan dikî li ser cergê xwe û dibî şevçiraya Kurdistanê, di sîgoşeya sê sînorên li ser dilê xwe ji hev parçe dikî û wekî pêla çemekî har ji sê aliyan de xwe berdidî ber deşt û geliyên xwarê yên Rojhilat, Başûr û Bakurê xwe.

Gever, hemû jî berxikên ber dilê dada xwe bûn, keçên kej î çavreş, esmer î çavbelek; lawên simbêlqeytan, bejnrihan, hemû, kur û keçên herî bijare yên şar û gundê xwe bûn, dilê wan behra hêviyan, çirûska çavên wan bi hêrsa azadiyê dagirtî, hemû jî, wekî gewherên nedîde bûn… Gever, hemû jî law û keçên te bûn…

Gever, ne bi sedan, bi hezaran hatin û çûn; ketin û şîn bûn, ketin û rapelikîn, giş bûne hêviya 'xweziyên çilmisî' yên milletekî baskşikestî…

Gever, hemû dilgewher bûn; çavê wan li asoyên pêşerojeke ronak, hemû jî mirovperwer bûn; çavê wan li azadiya milletekî dilpak.

Ji bo avedan bibe welatek kavil, ji bo geşedan bibe jiyanek bidil, ji bo zana û serfiraz bibe miletek jixwesil; wan di gevera dilê xwe de gewherê azadiyê çand û ji bo vê oxira xwe her yek ji wan bû stêrkeke geş Gever, her şev li asîmanê te zêrevaniya zarokên te yên çavçiya dikin…

Gever, hemû zarokên te bûn, niha jî, ew kulîlkên te ne, li deşta te şîn bûne, Gever, hay ji wan hebe, ew li ser bextê ne!...

Gever!...

## 'Hisreta Emir' kurdên Ermenistanê vedibêje

Pirtûka nivîskar Emerîkê Serdar ya bi navê 'Hisreta Emir' ku mijara pirtûkê kurdên ku li Ermenistanê dijîn e dertê.

Di pirtûkê de gumanên jiyan û pêşeroja kesên ku li dîasporayê dijîn bi zimanekî zelal hatiye nivîsandin. Pirtûk di nav kurdên Ermenistanê û Asyaya Navîn de rastî eleqeke germ hat. Çîrokên ku di pirtûkê de cih digirin yên wekî "Hisreta Emir", "Hetanî Kengê", "Eşîr Bavê Eşîreyê" û gelek çîrokên pirtûkê yên din de jiyana kurdên Ermenistanê hatiye vegotin.

**Jiyana kurdên dîasporayê**

Nivîskar di pirtûkê de jiyana kurdên ji ber ku ol, bawerî û çanda wan cuda ye û her tim ew parastine di çîrokan de zelaliya ziman ya ku parastine bi kar aniye. Di çîrokan de jiyana kurdên dîasporayê ya dijwar û zehmet bi çîrokan hatiye ziman. Hin çîrok qewimîne û ji rastiya jiyanê her çiqas hatibin girtin jî mirov dibêje ku qey em di serdemeke din de dijîn û mirov dikeve hisiyateke wisa. Di mirov de ev hest peyda dibin.




Nivîskarê pirtûkê Emerîkê Serdar hê jî li Ermenistanê serokatiya Yekîtiya Nivîskarên Kurd dike û berê di radyoya Rewanê de dixebitî. Her wiha Serdar di navbera 1962 û 2006'an de rojnameya kurdî ya herî temendirêj ango di Riya Teze de xebitî. Di nav xebatên xwe de di rojnameyê de herî zêde karê redaktoriyê kir. Nivîskar 74 salî ye û hê jî jiyana xwe li Ermenistanê didomîne. **REWAN**

**Bîranîn**



Zeynep Katar (ARJÎN ÇEM)
1984 BEDLÎS
28.05.2008 (TENDUREK)

Rûyê xwe ji bilî çiya
Nezîvirîne tu aliyan
Bila germahiya rojê xwe
bide rûyê te
Bila heybeta çiyan di rûyê
te de xuya bike
Û ez yanî tu
Tiştê tu, em in
Em ê hêviyê li dilê xwe
bar bikin
Û bigihêjin hev…



Husnu Kipçak (ZAGROS VAN )
1977 WAN
28.05.2008 (TENDUREK)

**Malbata Kipçak û Malbata Katar**

www.arsivakurd.org

Hawar
28 Gulan 2009 Pêncşem

## Tehmeke xweş

Fêkiyê erderhayê an jî bi navê din “pîtaya”. Ev fêkî li deverên tropîkal şîn dibe. Qalikên wî mîna neynûkên mirovan e. Rengê wî jî pembe ye. Hundirê vî fêkî cuda jî spî ye û weke kîviyê dendikên wî yên reş hene. Tehma pîtayayê jî dişibe tehma kîviyê hinekî tirş e. **AMED**



# Li çiyayên berz û bilind Hîp hop!

Hunermend Serhedo li çiyayên Kurdistanê bi terzê xwe konsereke Hîp hopê da. Serhedo got ku wî xeyala xwe ya zaroktiyê bi cih aniye û dê her tim girêdayî çanda ku li çiya hatiye afirandin be

**MEHMET NURÎ EKÎNCÎ** ZAGROS

Hunermendê ciwan Serhedo ku stranên xwe yên bi tarzê Hîp hopê tê nasîn li çiyayên Kurdistanê ji bo gerîlayan konserek da. Hunermend Serhedo konsera xwe ya ku li çiyayên Kurdistanê daye bi gotinên “min xeyalên xwe yên zaroktiyê bi cih anî” tîne ziman.

Hunermend Serhedo dibêje ku çiya û gerîla bûye çavkaniya hunera kurd û dê xebatên xwe yên di pêşerojê de giraniyê bide gerîla. Serhedo ku cara yekem li çiyayên Kurdistanê konserê dide hestên xwe wiha anîn ziman: “Ez di nava derdorên welatparêz de mezin bûm. Bi naskirina gerîlayan mezin bûm. Piştî ku min dest bi hunermendiyê kir çûna nava gerîla û konserdayîn ji bo min xeyaleke mezin bû. Beriya çend salan mamosteya min a kreşê ji min re gotibû ‘dema ku tu 4 salî bûyî, te digot ez ê biçim gerîla, tu hêj neçûyî’ Min jî bersiva ‘neçûme’ da wê. Lê min her tim gerîla û jiyana gerîla meraq dikir. Li Ewropayê min pir çiya û gerîla guhdar kir. Bi taybetî jî hevalên gazî her tim qala gerîla dikirin. Nedîtina cihê ku min her tim meraq dikir ji bo min kêmasiyeke mezin bû. Ev demek e ez li van çiyan bi gerîlayan re dijîm. Me konser da. Ev xebatên me dê bidomin jî. Nêzîkatiya gerîla û germbûna wan hestên cuda diafirîne. Ez nikarim van hestan vebêjim”.



**‘Jiyana gerîla pîroz e’**

Serhedo piştî ku xeyala xwe bi cih aniye tiştên ku lê rast hatiye jî wiha anî ziman: “Tiştên ku min der barê gerîla da guhdar kiribûn min ew dîtin. Ji ber ku her tim di nava welatparêzan de mabûm qala zehmetiyên çiya û gerîlatiyê dihat kirin. Di nava jiyana ku her tim dijmin dixwaze tune bike de bêguman zor û zehmetî hene. Ev tiştekî normal e. Gerîla jî mirov in. Lê gerîla ji bo me hêzeke pîroz e. Piştî ku ez hatim vir min ev yek baş dît. Di bin îradeya gerîla û çiyan de hêza wan a manewî û têkiliyên wan ên mirovî hene. Vê yekê mirov nikare li Ewropayê bibîne. Li wir hemû derfet hene lê manewiyat tuneye. Ez tenê mînakeke biçûk bidim. Gerîla ji bo ku çayê dem bike saetekê mijûl dibe. Dema ku dem dike qedeha yekemîn bixwe venaxwe dide hevalên xwe. Ev tiştekî pir girîng e. Ev yek girêdana gerîla û hêza wan a manewî nîşan dide. Dîsa di hemî artêşan de kumanya heye. Leşker wê dikin hembêza xwe û xwe didin aliyekî û xwarina xwe dixwin. Lê gerîla ne wisa ye. Gerîla xwarina xwe datîne û bi hemû hevalên xwe re parve dike. Min ew yek dîtin. Ji ber zikreşiya me ya li Ewropayê ez pir êşiyam. Dema ku min ev hevaltî, germbûn û moral li vir dît niha ez difikirim ku gelo ez ê çawa vegerim Ewropayê.”

**‘Divê li gorî têkoşînê tevbigerin’**

Serhedo der barê xebatên çandî yên ku li çiyayên Kurdistanê gerîla dikin de jî hest û nêrînên xwe anîn ziman û wiha got: “Me bi gerîlayan re gelek nîqaş kir. Ev der cihekî pir bi nîzam e û di warê çandê de jî pir pêşketiye. Ligel êrîşan pir ji xwe bawer in. Di nîqaşan de derket holê ku eleqeyeke mezin nîşanî hunermendên kurd didin. Daxwaza gerîla ew e ku hunermend li gorî têkoşînê bixebitin. Li çiya her tişt bi xwêdanê tê afirandin. Kesên ku li gorî vê yekê xebatên hunerî nakin bêguman dê neyên hezkirin. Ez jî di nav de heke ev neyê zanîn bêguman gerîla îtibarî kesî nake. Hezkirin û îtibar dîtina kurdan bi saya têkoşîna gerîlayan derketiye holê. Qasî hunermendan divê rewşenbîr û siyasetmedarên me jî vê yekê bizanibin û bifikirin. Ji bo pêşketina me wan rê nîşanî me dane û derfet afirandine. Li Ewropayê û deverên din kesên ku ji xwe re dibêjin hunermend vê yekê dizanin lê naxwazin bibînin.”



Li çiyayên Kurdistanê ji ber ku cara yekem bi tarzê xwe konserê dide Serhedo pir ketiye heyecanê jî. Di vê mijarê de jî hestên xwe wiha vegotin: “Dema ku ev tiştên ku min vegot, difikirim bêguman hinekî mehçûp bûm û ketim heyecanê jî. Konserdayîna li hemberî bi sedan gerîlayan tiştekî pir cuda ye. Mirov nikare hestên xwe vebêje. Piştî ku min ev der dît min ji xwe re got divê ez bêhtir bixebitim. Dîsa min nizanibû ku li çiyan stranên min evqas tê guhdarîkirin. Gelek stran bi min gotin. Lê ji bo min pir zor bû. Ji ber li hemberî gerîlayên ku ji bo min pir pîroz in stran gotin ne tiştekî rehet e.”

Serdeho diyar kir ku çiya û gerîla çavkaniya çand û hunera kurd e û axaftina xwe wiha domand:

“Min li vir dît ku piraniya gerîlayan helbestan dinivîsin û rojnivîskê dinivîsin. Min bi dengên wan stran guhdarî kirin û ez pir kêfxweş bûm. Li Ewropayê ne mimkûn e ku mirov wan hestan hîs bike. Dema ku klîpên Oremar û Zapê derketibû ez pir kêfxweş bûbûm. Muzîkên wan stranan pir xweş e. Ya duyemîn ev ji bo hunermendên Bakur û Ewropayê rexneyek bû jî. Di nava bêderfetiyan de tiştên ku diafirînin pir baş in. Lê li deverên din derfet pir in. Ji ber ku ji çavkaniyê dûr in neafrîner in û di warê hestan de jî pir qels in. Divê gelek kes bên vir û vê deryaya çandê bibînin û jê îlhamê bigirin. Min şert û mercên Tev-Çandê jî dît bi kedeke mezin tiştan diafirînin. Di nav de hest, hîs û ked hene.”

**2 soz dane xwe**

Hunermend Serhedo di dawiya axaftina xwe de got ku dema ku vedigere di 2 xalan de soz daye xwe. Yek ji wan dê ji bo pere stranan nebêje ya duyemîn jî dê li hemberî tu kesan serê xwe netewîne. Dê her tim bi wan sozên xwe ve girêdayî be. Dîsa dema ku vedigere dê albuma xwe derxe. Ji bilî vê jî ji bo klasîkên kurdan projeyek çêkiriye û didomîne. Her wiha dê li ser helbestên gerîlayan jî xebatekê bide destpêkirin. **ANF**

## Îsot derman e

Li Kurdistanê îsot weke ku tê zanîn pir tê bikaranîn. Bi awayekî xav an jî di nava xwarinan de tê xwarin. Lê taybetiyeke îsotê a din jî heye çaya îsotê jî tê çêkirin. Ev çay ji bo hin nexweşiyan baş e. Mirov dikare çaya îsotê bi vî rengî amade bike. Pilek îsotê hûrkirî bikin nav edehek ava kelandî, bila 10 deqeyan di dema xwe de bimîne û hêdî hêdî, germe germ vexwin. Ji bo sermagirtinên aşik, rûvik û hemî awayên sermagirtinan şifadar e. Her wiha ji îsotê melhem jî tê çêkirin. Ev jî wiha tê çêkirin: Bîbera hişkirî yan jî ter baş bihêrin û hinek dohnê zeytê berdin ser û li cihên ku dêşe xin. Alman sotebend (nêrebend) a ABC ji îsot û ji kulîlka tolkê (kulîlka zêrîn) çêdikin. Hindistanî jî sotebendê ji îsot, sîr û bîbera reş çêdikin. **AMED**

## Ji bo hawirdorê çalakiya balkêş

Bajarê Gentê yê Belçîkayê amadekarî dike ku di hefteyê de rojekê di cîhanê de bibe bajarê yekem yê vejeteryan yanî goştnexur.

Armanca xwediyên projeyê ew e ku zirarên germahiya global û yên goştxwarinê kêm bikin.

Roja Nexwarina Goşt ji hefta borî ve dest pê dike. Bi mebesta vê rojê xebatkarên dewletê û yên şaredariyê wê ew rojê xwarinên vejeteryen yanî yên bêgoşt û zêdetir sebze bixwin.

Rayedarên bajarê Gentê bi vî awayî dixwazin balê bikişînin ser tesîra heywanên çewlikan a ji bo hawirdorê.

Netewên Yekgirtî heywanên çewlikan û xwedîkirina wan yek ji sedemên girîng a xirabûna hawirdorê dide zanîn. Gazên ku dibin sedema germbûna global ji pênca yek ji van heywanan derdikevin.

Li gor biryara meclîsa bajarê Gentê di nava koma ku vê hefteya yekem dev ji xwarina goşt berde de revebirên bajêr û siyasetmedar jî hene.

Wê di meha îlonê de jî êdî di dibistanan de ji xwendkaran bê xwestin ku rojekê ji hefteyê wek roja vajeteryenî îlan bikin û goştî nexwin.

Bi saya vê bernameyê, dê zirara ku bajarê Gentê dide hawirdorê kêm bibe û bi qelewbûnê yanî obezîteyê re serî derxin. Wek tê zanîn Belçîka yek ji welatên ku qelewbûn zêde belavbûyî ye.

Di çarçoveya roja vajeteryan de ji bo dikan û restorantên ku xwarin û berhemên vajeteryen difroşin xerîte hatin çêkirin. Ji niha ve li bajêr 90 hezar nexşe hatine belavkirin.

Gent li rojavayê Belçîka bajarekî tûrîstik û dîrokî ye. Şêniya bajêr 250 hezar e. Li bajar zanîngeheke mezin jî heye. Bajêr yek ji deverên tûrîstîk û naskirî ya Ewropayê ye. **GENT**

## Şaredariya Misircê kolanan paqij dike

Şaredariya Misirca Sêrtê li navçeyê dest bi xebatên paqijiyê kir. Midûriyeta karê Paqijiyê ya Şaredariya Misircê û Midûriyeta Îtfaiyeyê bi hev re xebatên paqijiyê dan destpêkirin. Di çarçoveya xebatan de kolan, cade û peyarê têne şûştin. Şaredarê Misircê Necat Yilmaz diyar kir ku ew girîngiyeke mezin didin paqijiya navçeyê û wiha axivî: “Bi hatina biharê ji bo ku cade û kolanên me paqij bibin me xebat da destpêkirin û em cade û kolanên navçeyê dişon. Ji bo navçeyeke paqij em ê hemû derfetên xwe bişixulînin.” Yilmaz xwest ku şêniyên navçeyê jî ji bo ku navçe paqij bibe bihîstiyarî tevbigerin. **SÊRT**





## Ducaniya 92 salî

Ducanîbûna jina 92 salî Huang Yijun mirov matmayî hiştin. Huang Yijun di sala 1948’an de ducanî bû. Zaroka wê hêj di malzarokê de mirî bû. Ji ber ku 100 sterlinê Huang Yijungê nîn bû nekarî emeliyat bibe. Ji ber nerazîbûna malbatê qala wê mijarê nekir. Heta niha Yijun rastî tu pirsgirêkan nehatiye. Piştî 60 salan ji ber êşa mîdê çû doktoran û ducanîbûna wê derket holê. Doktorên ku ji ber bûyerê matmayî man û diyar kir ku heta niha rastî tiştekî bi vî rengî nehatine. Doktoran, destnîşan kir ku divê Yijun bê emeliyatkirin û zarok ji malzarokê bê derxistin. Li gorî doktoran ev tişt mucîze ye. **PEKÎN**

www.arsivakurdi.org